Ronahî
www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 938 | 02-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني

# Kêmbûna çavkaniya debarê çemê Firatê her ku diçe zehmetiyên jiyanê pirtir dike

**Nisrîn Kenan û Xalîse Hec Ebid Qadir li ser avê û cereyana li herêmê wiha gotin: "Dewleta tirkî bi her rê û rêbazê gefan li herêmê dixwe. Ji bo wê divê gelê herêmê bi me re bibe alîkar da em bikarin li dijî van kiryaran bisekinin û çareseriyê ji pirsgirêkan re bibînin."**

Dewleta tirkî ya dagîrker ji bo ku sivîlên bakur û rojhilatê Sûriyê tengav bike serî li her rêbaza qirêj dide. Herî dawî jî birîna ava Firatê ye. Li ser vê mijarê Hevseroka Desteya Enerjiyê ya herêma Firatê Nisrîn Kenan û Hevseroka Midûriyeta avê ya herêma Firatê Xalîse Hec Abid Qadir nirxandin kirin.

Nisrîn diyar kir ku ji ber kêmbûna avê û ji ber gel nave alîkar dihêle ku seatên cereyanê li herêmê kêm bibin û wiha axivî: "Di van demên dawiyê de seatên cereyanê baş bûn lê niha dîsa rewşa cereyanê nebaş e, ji ber ku her stasyonek cuda ye û li gorî bar cereyanê radike û li herêmê tê belavkirin. Li herêma Firatê bi xwe li sê bajaran tê belavkirin, Kobanê, Sirîn û Eyn Îsa. Herî zêde li Kobanê û bajarokê Sirînê tê belavkirin, tişta ku em jê zehmetiyan dibînin ew e ku gel bi me re nabe alîkar. Dema ku saetên cereyanê li herêmê baş dibin wê demê em û gel kêfxweş dibin, li hemberî van hemûyan jî dîsa gel pir zêde cereyanê bi kar tîne. Em wateyê didin ku şênî di malên xwe de ji bo tiştên pêwîst cereyanê bi kar bîne ango xwarina xwe amade bikin lê divê bi qasî ku bi wan pêwîst be, ji bo cîranên me jî faydeyê ji wan seatan bibînin. Gel gazin û giliyan dike, ji bo vê jî divê di serî de gel bi me re bibe alîkar da ku em bikaribin, xwe bigihîjînin her derê ji bo cereyan têra her kesê bike. Rast e av kêm e û em gelek zehmetiyan dikşînin lê ya girîng ew e ku em bikaribin xwedî li avê û cereyanê derkevin."

**"Em cereyan li gorî pêwîstiyên sereke bi kar bînin"**

Nisrîn destnîşan kir ku pêwîstiya wan bi alîkariya gel heye û wiha domand: "Dema cereyan bê û her kes li gorî pêwîstiyên xwe bi kar bîne wê demê her kes wê pêwîstiyên xwe pêk bîne. Her yek tenê lembeyekê pêxe wê demê 11 hezar kes wê bibin xwediyên cereyanê, ji ber ku bandorê li stasyonê dike, dema ku bandor bike jî cereyan bi rojan qut dibe û gel bê cereyan dimîne. Belkî her kes bibêje ku lembeyên me bandorê li kesekî nakin lê na her lambeyek zirarê dide û bi xwe re neyîniyan derdixe. Ji bo vê jî em mecbûr dibin li gorî herêmê cereyanê belav bikin, di demên pêwîst de ger av hebe em wê demê hewl didin gel bê ronahî nehêlin. Ji bo cereyan têra her kesê bike divê em bi roj lambeyan pêxistî nehêlin. Gelek caran me gel hişyar kir, hin kes li ser vê biryarê sekinîn lê dîsa jî hin kes vê biryarê pêk naynin. Ji bo vê biryarê me hin endamên xwe ji bo cezakirina kesên ku lembeyên xwe bi roj pêdixin derxistin nava navenda bajar. Şûna ku em zagonan pêk bînin em dixwazin bi zimanê rehet gel hişyar bikin, ez bi hêvî me ku her kes li ser van mijaran bisekine. Di vê salê de em hewl didin li cihê lawaz ango cihê ku cereyan lê kêm e, projeya ku çawa bikaribin cereyan têra her kesê bike, ji bo wê xeteke 66 ji Bendava azadî heya Kobanê bikşînin, ji bo cereyana Kobanê cuda be. Ev proje jî dîsa dê bi alîkariya gel pêk bê."

**"Kêmbûna avê pirsgirêkan zêdetir dike"**

Xalîse da zanîn ku her çiqas av kêm bibe jî wê pirsgirêkan bi xwe derxe holê û wiha bi lêv kir: "Ava Firatê di meha Çileyê de ji aliyê dewleta tirk ve hatiye qutkirin, ji wê rojê heye niha em bi kêmbûna avê re rû bi rû dimînin. Bi vê ve girêdayî mijara ku cereyan li herêmê tê kêmkirin, li vir gazinên gel zêde dibin. Lê ji milekî din ve gel baş li avê mêze nake, ev jî bi xwe re pirsgirêkê zêdetir dike lê hewldanên me hene ku em hin projeyên nû çêbikin. Heya ku ev pirsgirêk çareser nebe wê tu carî pirsgirêka cereyanê jî çareser nabe. Me xwest em projeyeke nû ava bikin lê her tim hin astengî li pêşiya me derdikevin ev yek jî dihêle ku proje bi awayekî serkeftî nebe. Ji gel jî tê xwestin ku ji aliyê avê ve baldar bin da ku cîranên wan bê av nemînin. Hêviya min ji gelê me heye ku bi me re bibin alîkar avê di cihê vala de nerijînin, ji ber ku av jiyan e. Her wiha ji bo çandiniyê jî bandoreke mezin li ser tê kirin, jixwe îsal jî çandinî çênebû, ji bo wê jî em di milê çandiniyê de kêm dimînin, ev dihêle ku gel bêkar bimîne û rewşa çandiniyê lawaz bibe. Di heman demê de lawir jî ji kêmbûna vê bi bandor dibin, gelek lawir hene bê av nikarin bijîn. Dewleta tirk bi şerekî topyakun dixwaze bi avê, bi şerê derûnî, şerê leşkerî û şerê taybet gelê herêmê qir bike. Ev planên dewleta tirk ji destpêka aloziya Sûriyeyê ve dest pê kirine û heya vê kêliyê berdewam dikin. Qaşo ji aliyê navneteweyî ve panel hatin lidarxistin ku dê dewlet li ser hin xalan bisekinin lê tenê panêlên wan di gotinê de dimînin."

**ANHA**



## QUNCIKA TÊGÎNAN

| | |
|---|---|
| Aktîf (Fransî) | Çalak, bibandor, zindî, bi liv û tevger, şixulker. Kesê pir dixebite: Ev nivîskarekî aktîf e |
| Arşîv (Fransî) | 1. Cihê ku kovar, rojname, wêne û berhemên din tê de tên parastin. 2. Materyalên ku tên parastin. |
| Arkeolojî (Fransî) | Zanista kolanê, şûnwarnasî, vekolîna dîrokê bi riya tiştên ji serdemên berê ve di binê erdê de mayîn û pişt re hatîn dîtin. |
| Aktivîst (Fransî) | Çalakvan, çalakker. |
| Ekolojî (Fransî) | Şaxekî zanistê ku li ser têkiliya zindiyan hem ya di navbera wan de hem ya bi derdora xwe re hûrgiliyê dike. |
| Hevpar | Hevbeş, hevpişk, şerîke, şirket. |
| Hevkar | Şirîk, hevpişk, kesên bi hev re kar dikin. |
| Konsept (Fransî) | 1. Têgîn. 2. Têgihîştin, nêrîn, fikir. 3. Rêbaz. 4. Pergal. |
| Rêgeh. | Cihê ku rê tê re derbas dibe. |
| Siruşt. | Xweza, tebîet. |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | Z | E | N | E | ■ | H | ■ | N | A |
| 2 | A | W | ■ | S | A | E | T | ■ | L |
| 3 | L | ■ | A | A | ■ | B | Û | R | A |
| 4 | ■ | F | E | ■ | N | ■ | L | A | ■ |
| 5 | A | Ê | ■ | X | O | N | E | ■ | A |
| 6 | ■ | K | E | W | ■ | Û | ■ | Û | R |
| 7 | B | Î | N | E | R | ■ | A | ■ | D |
| 8 | Û | ■ | Î | ■ | E | J | N | Û | ■ |
| 9 | M | Î | ■ | A | Ş | Ê | F | ■ | |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | | | ■ | | | ■ |
| 2 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 3 | ■ | | | | ■ | | | | ■ |
| 4 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 5 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 6 | ■ | | | | ■ | | | | |
| 7 | | | ■ | | | | ■ | | ■ |
| 8 | | ■ | | | ■ | | | | |
| 9 | | | | ■ | | | | ■ | |

**ÇEP-RAST**

1. Beyreq, sembola welatan... Nexweşiyek
2. Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê... Cure, celeb... Yezdanekî misrî
3. Xwarina ku êvariyan tê xwarin... Axayê binemalê an jî hozê
4. Kinceke zivistanî ya stûr e û hetanî ser lingan dadikeve... Baneşana bêhntengiyê
5. Roja em tê de ne... Xweliya piştî şewatê
6. Awayê bangkirinê ya xwîşka mezin... Bajarekî me
7. Kar û xebat... Demên rojê
8. Ji bo bûkê, birayê zavê... Helale, lale
9. Sedemkarê tevgerê, paldêr... Darê ku kesên mîna hikumdar, mirovên dînî ku wekî sembola hêzê bi kar tînin


**JOR-JÊR**

1. Li hin herêman şûna 'dayik'ê tê gotin... Notayek... Pêxemberek
2. Cihê herandinê... Dijberê rengî spî
3. Cureyekî sebzeyên tuj ku rihayî pir jê hez dikin... Dema mirov şîr bidoşe û dest nedê tebaqeya bi ser dikeve, qeymax
4. Dua, niyaz... Ji vir û şûnde, ji niha pê de
5. Bi soranî 'av'... Cînavka pirsiyariyê ya ku tê wateya; li ku ye?
6. Pisporê ekonomiyê
7. Cejn, eyd... Notayek
8. Ji bo gotin û biwêjên taybet ku ji aliyê civat an jî kesên serserî ve tên bikaranîn... Kurteya rêxistina rizgariya Îrlandayê
9. Hejmarên yek, sê, pênc, heft û hwd.... Xanedana qraliyeta Vîetnamê

Ronahî
www.ronahi.net/ku/ | Jimar : 938 | 02-Sibat- 2022 | Rojnameya siyasî, civakî û çandî

## `Ne rêberê Kurdan tenê ye, rêberê mirovayiyê ye`

Benjewîn Elî: Armanca Tirkiyê ji tecrîdkirina Rêber Abdullah Ocalan tinekirina projeya Neteweya Demokratîk e. ***R-4***



# `Doza Yasemîn doza raya giştî ye`

Jûliya Xelo: Zarok paşroja welat û civakê ne, li şûna ku parastina wan bikin wan tine dikin. ***R-2***

# BILA HER KES ÇETEYÊN XWE BIBE WELATÊ XWE

## 'Civînên Tirkiyê yên berî niha bi çeteyan re serkêşiya wê ji êrişa DAIŞ`ê re eşkere dikin'



Ehmed Karamus: Êrişa ser girtîgeha Xiwêran, hevbeş bû. Di bingeh de dewleta Tirkiyê ya dagîrker êrişkar bû û di bin cil û tîpên DAIŞ`ê de êrişa xwe pêk anî; xwest bi vê êrişê dagîrkeriya xwe berfireh bike. ***R-4***

## Bêdengî tê wateya hevkariyê



Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Ihsan Şiblî bang li civaka navneteweyî kir ku sozên dayîn bi cih bîne û sûcên dewleta Tirkiyê ya faşîst rawestîne. ***R-5***

## HPG: Êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên 29'ê Çileyê bêencam bûn




HPG`ê Li ser êrişên Dewleta tirkî ya dagîrker yên 29'ê Çileyê yên ser Herîmên Parastinê yên Medya daxuyaniyek da û da zanin ku êriş bêencam bûn. ***R-3***

## `Wê xeyalên dagîrkeran li ber şapeya têkoşîna azadiyê biçin`

Mûnteha Salih: rişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û bang li dewletên garantor yên li herêmê û civaka navneteweyî kir ku pêşiya van êrişan bigirin. ***R-2***

### Tirkiye-DAIŞ û plana Hesekê!

Ahmet Aktaş **R-4**



### Enqere û Şam hêviya wan DAIŞ e

Zekî Bedran **R-5**

### Ji êrişa ser girtîgehê kî berpirs e?

Dilyar Cizîrî **R-6**



## Di Gurzê Gelan de Parastina Rewa

Di destana 'Gurzê Gelan' de dayîk, jin û ciwanên Hesekê li kolan û taxên bajêr, ji bo parastina xwe li gel şervanên QSD`ê tev geriyan. Vê rewşê di asta herî jor de girîngiya pergala Xweparstina Rewa nîşanî cîhanê da. ***R-5***



## Walîtiyê nehişt standa ji bo xebata kurdî bê danîn




Walîtiya dagîrkeriyê ya Êlihê, nehişt Platforma Zimanê kurdî ji bo xebata xwe li bajêr standê veke. ***R-7***

## Li çanda deqê Xwedî derdikeve



Fatma Temel ku hewl dide çanda deqê ya bi hezarê salan biparêze dibêje, ez dixwazim çanda deqê bidomînim û bigihînim nifşên nû. ***R-7***

### Jin û mêranî

Sîpan Şînda **R-7**

### Şêniyên taxa Şêxmeqsûd li hemberî dorpêça hikumeta Şamê hewl didin debara xwe bikin

Welatiyê bi navê Hemo Şêx Hemo li taxa Şêxmeqsûd hewl dide bi çandina sebzeyan di cihekî piçûk de li kêleka mala xwe, debara jiyana xwe bike, da ku bandora dorpêça hikumeta Şamê ya li ser taxê sivik bike. ***R-6***

### Girtîgeha Xiwêranê... pêşbînî û daxwazî

M.Emîn Sadûn ***R-6***

## Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo bi klaman hat bîranîn

Akademiya Ma Mûsîkê, di çarçoveya şahiyên Rojên Ma Mûzîkê de Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo, bi klamên bi meyan bîr anî.

Akademiya Ma Mûzîkê starta şahiya 4. ya "Rojên Ma Mûzîkê" ku diyariyê mîrê bilûrê Egîdê Cimo kirin li avayiya xwe ya li navçeya Peyasa Amedê da. Heskiriyên Cimo, hunermendên ciwan û gelek kes tevlî şahiyê bûn. ***R-7***

## Nivîsgeha Têkiliyên Giştî du malbat li hev anîn


Nivîsgeha Têkiliyên Giştî ya Hêzên Ewekariya Hundir ya Herêma Cizîrê du malbatên ku berî mehek û nîvê nakokî di navbera wan de derketibûn, li hev anîn. ***R-6***

## Li Girtîgeha Boluyê jî girtiyek hat qetilkirin



Mehmet Hanîfî Bîlgîn ê ku 29 sal û 5 mehan li Girtîgeha Tîpa F ya Boluyê dîl gîrtî hat qetilkirin. ***R-3***

## QSD`ê nasnameya 13 şehîdên din jî eşkere kir



QSD`ê nasnameya 13 şervanên xwe yên 22`ê Çileyê di operasyona dijî çeteyên DAIŞ`ê de li girtîgeha Sînaa ya li Hesekê şehîd bûn, ku didû ji wan biraiyê hevin eşkere kir. ***R-3***

# `Doza Yasemîn doza raya giştî ye`

Jûliya Xelo: Zarok paşroja welat û civakê ne, li şûna ku parastina wan bikin wan tine dikin.

Darîn Silê/Qamişlo



Zaroka bi navê Yasemîn ya ji bajarê Minbicê ku hê pênç salên xwe temam nekirine, 27`ê Çileya 2022`yan destdirêjî lê tê kirin û piştre bi awayekî hovane tê kuştin. Piştî ku tê kuştin jî li ser riya bazara Minbicê datînin û xelkên wê deverê danê êvarê cenazeyê wê dibînin.
Li gorî agahiyên malbatê dayîn; dema Yasemîn ji malê derdikeve tê revandin û bi saetan xuya nake. Malbata wê li nava taxê û li bajar lê digere lê nabîne. Piştre malbat ji xelkên deverê dibîhîzin ku li ser riya sûka Minbicê cenezeyek dîtîne. Heta niha jî kujerê Yasemîn nehatiye naskirin. Hin gotin derketine holê ku piştî destdirêjiyê malbatê bixwe kuştiye. Lê rastiya vê agahiyê jî heta niha nehatiye piştrastkirin, lewra heta niha ne diyar e ka çawa û ji aliyê kî ve hatiye kuştin.
Derbarê mijarê de rêvebera Komîteya Şilêr ya Zarokan ya Qada Civakî Jûliya Xelo, ji me re axîvî. Jûliya destdirêjî û sûcên li dijî zarokan şermezar kirin û axaftina xwe wiha domand: "Wekî ku em dibînin li Sûriyê rojane tundî û işkence li zarokan tên kirin. Herwiha hin kesên bêwidan û ji mirovayiyê pir dûr bi awayekî bêexlaq nêzî



zarokan dibin. Bûyera herî dawî jî ku li ber çavê her kesî hat derbaskirin, bûyera zaroka bi navê Yasemîn bû. Ev bûyerên wisa encamên zihniyeta qirêj ya desthiladariya zilam in. Yek ji qurbanên vê zihniyetê Yasemîn bû. Doza Yasemîn doza raya giştî ye. Çimkî zaroka bi temenê xwe pêncsalî ku hê çavê xwe li dinyayê venekiriye û nizane ka dinya çi ye, rastî vê işkenceyê hatiye. "

**`Bi kuştina zarokan şerê taybet didin meşandin`**

Jûliya Xelo da zanên ku dijmin bi riya bêexleqî û tinekirina zarokan şerê taybet li ser civaka wan dide meşandin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dijmin dixwaze bi riya destdirêjiya li ser zarok, jin û kuştina wan zihniyet û tevgera azadiyê têk bibe. Her kes dizane ku bakur û rojhilatê Sûriyê di rewşeke şer de ye. Nêzî deh salî ye ev zarok di nava vî şerî de dijîn. Ne bes e ku zarokên me ji zarokatiya xwe qut bûne, rojane rastî kuştin, işkence, tundî û revandinê tên. Ji ber ku zarok paşroja vî welatî ne, dijmin jî êrişî zarokan dike. Herwiha dixwazin tirsê bixin dilê zarokan û civakê ku ji jiyanekê ewle bê hêvî bibin."

**`Li şûna ku parastina vî nifşî bikin wî tine dikin`**

Jûliya got, yê ku vî sûcî derheqê zarokan de bike divê cezayê wî ji yê her kesî girantir be û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Çi gunehê van zarokan heye ku bibin qurbanên vê zihniyeta qirêj û hovîtiya ku nikarin xwe jê rizgar bikin. Li şûna ku parastina vî nifşî bikin, tine dikin. Kuştinên bi vî rengî li ser rûye erdê, sûcên herî giran in. Çimkî ji mrovayî û wijdanê pir dûr in û xetera herî mezin e li ser civakê Ji bo wê jî divê cezayê van kujeran pir giran û tûj be. Da ku bûyerên bi vî rengî neyên dubarekirin û zarokên me bi awayekî aram di bajarê xwe de bijîn."

**`Divê zihniyeta qirêj were guhertin`**

Jûliya bîr xist ku sala çûyî gelek zarok rastî tundiyê hatin û wiha got: "Berî bûyera Yasemîn gelek bûyerên wisa di derheqê zarokan de çêbûne. Jixwe her kes dît zaroka bi navê Nehla ya li kampa holê ji aliyê bavê xwe ve hat îşkence kirin û kuştin. Bi rojan xistibûn qefesê û destê wê kelemçe kiribûn, hata ku jiyana xwe ji dest da. Berî wê jî gelek zarokên din rastî tundiyê hatin. Ji ber wê jî divê rê li pêşiya va bûyerên bêexlaq bê girtin. Divê Meclisa Edaletê cezayekî giran li van kesan bibire. Lewra çiqas ceza giran be jî mafê vê zarokê nade. Mijar ne bi tenê cezakirin tê çareser, ya herî girêng ew e ku em karibin vê zihniyeta qirêj bidin guhartin. Ciqas ceza tûj be jî, heta ku em zihniyetê nedin guhertin wê bûyerên wisa werin dubarekirin. Ji bo wê jî divê em perwerdeyên xwe di nava civakê de zêde bikin û hişmendiya desthilatdar ya zilam ji holê rakin."
Rêvebera Komîteya Zarokên Şilêr ya zarokan ya Qada Civakî Jûliya Xelo, di dawiya axaftina xwe de got, rola herî girîn ya malbatê ye, divê malbat hay ji zarokê xwe hebin û bi baldarî nêzî wan bibin. Lewra em di rewşeke zehmet de derbas dibin û dijminê me jî dijminekî hov e. Wek komîteya zarokan em bi hêvî ne ku ev rêxistin û saziyên parastina zarokan ku şopandina zarokan dikin, hê zêdetir hişyar bin û li zarokên vî welatî xwedî derkevin.

# Wê xeyalên dagîrkeran li ber şapeya têkoşîna azadiyê biçin

Jiyan Ebas-Qamişlo

**Mûnteha Salih, êrişên dewleta tirkî ya dagîrker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê şermezar kirin û bang li dewletên garantor yên li herêmê û civaka navneteweyî kir ku pêşiya van êrişan bigirin.**

Di berdewama şerê li dijî gelên bakur û rojhilatê Sûriyê de dewleta tirkî ya faşîst bi awayekî hovane û di çarçoveya domandina şerê qirkirinê yê li dijî herêmê de, herî dawî êrîşî gundê Dibist, Xalidiye, Ebû Nîtone yên li rojavayê Eyn Îsay û rêya M4 kir.
Têkildarî mijarê welatiya bi navê Mûnteha Salih êrîşên dewleta tirkî ya dagîrker şermezar kirin û diyar kir ku dewleta tirkî ya dagîrker, bi rêbazên cuda rijandina xwîna gelê herêmê didomîne. Herwiha got, bi van êrişan kîn û nefreta xwe ya li hemberî gelên azadîxwaz nîşan dide û armanca dagîrkeriya Tirkiyê veşartina pirsgirêkên xwe yên navxweyî, têkbirina projeya Rêveberiya Xwesere û tola têkçûna DAIŞ`ê ye.

**`Êrişên hemwext yên dagîrkeriyê tirkî, ji bo zîndîkirina DAIŞ'ê bûn`**

Mûnteha da zanîn ku êrişên ser gundewarê Eyn Îsa û rêya M4 di heman wextî de êrişa ser girtîgeha Sînaa pêk hatin. Herwiha teqez kir ev nîşan didin ku koordîneyek di navbera dewleta Tirkiyê ya dagîrker û çeteyên DAIŞ'ê de heye û got, êrişa ser girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêranê û hewldana revandina çeteyên DAIŞ'ê ji girtîgehê, ji bo zindîkirina DAIŞ'ê li herêmê bû.

**'Wê xeyalên dagîrkerîyê têk biçin'**

Mûnteha dagîrkeriya tirkî wek dijberiya mirovayiyê bi nav kir û axaftina xwe wiha domand: "Planên dagîrkeran têk diçin, ji ber wê êriş û gefên xwe li dijî bakur û rojhilatê Sûriyê zêde dikin. Rêveberiya Xweser çawa li hemberî êrişên çeteyên DAIŞê li ber xwe da û herêmê ji wan rizgar dike, wê li hemberî dagîrkeriyê jî berxwedaneke mezin bike û xeyalên dagîrkeran bişkîne."
Mûnteha Salih diyar kir ku armanca êrişên dagîrkeriyê pêkanîna projeya tarî ya bi navê Osmaniya nû ye û axaftina xwe wiha domand: "Dagîrkeriya tirkî dixwaze Împaratoriya Osmanî zindî bike. Ji ber wê li herêmê dagîrkeriya xwe fireh dike. Lê wê nikaribe vê xewnê pêk bîne û wê li ber şapeya têkoşîna azadiyê biçe."

**`Çawa me bi bawerî û fikra xwe DAIŞ tine kir, emê planên dagîrkeran jî têk bibin`**

Mûnteha da zanîn ku şoreşa azadiyê li Rojava dest pê kir û piştre li bakur û rojhliatê Sûriyê belav bû û wiha domand: "Bi bawerî û berdêlên mezin gelê herêmê, ji hovîtiya DAIŞê hat rizgarkirin û vê serkeftinê gelek neyarên azadiyê yên weke desthilata Tirkiyê jî aciz ki-



rin. Ji bo wê Erdogan, bi her rê û rêbazê êriş dike û hewl dide ku şoreşa me tine bike. Lê li hemberî êrişan her tim berxwedan hebû û heta dilopek xwîn di canê me de hebe, em vê xakê bernadin û em dizanin ku riya têkoşînê çareserî û azadî ye.

**`Em bi ti awayî dagîrkeriyê qebûl nakin`**

Mûnteha Salih bang li gelên azadîxwaz kir ku li dijî dagîrkeriyê, asta berxwedanê bilind bikin û axaftina xwe wiha qedand: "Em bi ti awayî êrişên dagîrkeriyê qebûl nakin. Gelên herêmê gelek berdêlên giran dan û niha jî wê bi ruhê fedayî li hemberî êrişan bisekinin. Parastina xakê rewa ye û erkê her kesî ye. Cîhan tev armanca dewleta tirkî ya faşîst dizane. Em bang li tevayiya rêxistinên mafên mirovan û saziyên demokratîk dikin ku bêdeng nemînin, lewra bêdengî tê wateya hevkariya bi dagîrkeriyê re.
têkoşîna



# Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo bi klaman hat bîranîn

Akademiya Ma Mûzîkê, di çarçoveya şahiyên Rojên Ma Mûzîkê de Mîrê Bilûrê Egîdê Cimo, bi klamên bi meyan bîr anî.

Akademiya Ma Musîcê starta şahiya 4. ya "Rojên Ma Muzîkê" ku diyariyê mîrê bilûrê Egîdê Cimo kirin li avahiya xwe ya li navçeya Peyasa Amedê da. Heskiriyên Cimo, hunermendên ciwan û gelek kes tevlî şahiyê bûn.

**'Emê Egîdê Cimo bidin jiyandin'**

Yek ji perwerdekarên Ma Musîcê Mesûd Gever yê di şahiyê de axivî, çîroka jiyana Egîdê Cimo vegot û qala mîrateya ji muzîka Kurdî re hiştî kir. Gever diyar kir ku Egîdê Cimo bi bilûra ji qamîşê ji qamirgehê veqetandî çêkirî dest bi muzîkê kir û wiha got: "Em jiyana Egîdê Cimo ku bi koçberiyê derbas bû di dengê meyê de hîs dikin. Em wî bi rêzdarî bi bîr tînin. Em soz didin ku, weke Akademiya Ma Musîc û şagirtên Egîdê Cimo, em ê muzîka Kurdî pêşdetir bibin û Wî bidin jiyandin."
Di şahiyê de bi klaman bi meyan stranên Egîdê Cimo ku giyan danê yên Karapetê Xaço yên Lawikê Mêtînê, Berîvanê, Girê Sîra û stranên Radyoya Êrîvanê hatin strandin. Beşdarvanan demekî dirêj



lîlandin û ji bo hunermendan li çepikan xistin. Rojên Ma Musîcê wê heta 9'ê Sibatê bi çalakiyên cuda berdewam bike.
*ANF*

# Walîtiyê nehişt standa ji bo xebata kurdî bê danîn

**Walîtiya dagîrkeriyê ya Êlihê, nehişt Platforma Zimanê Kurdî ji bo xebata xwe li bajêr standê veke.**

Platforma Zimanê Kurdî, di 13'ê Cotmeha 2021'ê de li Êlihê nûnertî vekir û xebatên xwe yên ji bo kurdî bibe zimanê fermî û zimanê perwerdehiyê lezandin. Endamên platformê, ji bo kurdî bi partiyên siyasî û rêxistinên civaka sivîl ên li bajêr re hevdîtinan dikin. Endamên platformê ku zêdetirî 3 meh in li bajêr dixebitin, ji xeynî kampanyaya îmzeyan a li ser înternetê, di çalakiyan de jî îmzeyan berhev dikin. Endamên platformê, xwestin li bajêr ji bo xebtatên kurdî standê jî vegirin, lê belê Walîtiya Êlihê destûr neda. Walîtiya ku ji bo AKP'ê û hemû saziyên nêzî AKP'ê destûra vegirtina standan dide, daxwaza platformê ya ji bo vegirtina standê bi hinceta Covîd-19'ê red kir.

**Milyonek imze**

Berdevka Platformê Elîf Kivircik, bibîr xist ku armanca wan, heya 21'ê Sibatê li seranserê welêt milyonek îmze berhev bikin. Kivircik got: "Em bi boneya kampanyaya îmzeyan hevdîtinê bi gel re dikin. Helwesta gel pir baş e. Dibêje, gere dewlet vê daxwazê qebûl bike. Tenê îmzeyê nadin, di heman demê de îmzeyan jî berhev dikin. Forman ji me distînin û diçin li taxên xwe îmzeyan berhev dikin. Forman dadigirin û wan ji me re tînin."

**Walî nehişt**



Kivircik, da zanîn ku di Sersalê û kongreya HDP'ê de gelek îmze berhev kirine û got: "Me xwest em standê vegirin, lê walîtiyê nehişt. Me du caran serî lê da, lê walîtiyê her du serlêdan jî qebûl nekirin. Redkirina serlêdanan neyta wan aşkere dike. Nehiştina vegirtina standê, di asasê xwe de neqebûlkirina kurdî ye jî. Li bajêr daxwazên gelek sazî û dezgehan ên ji bo vegirtina standan tên qebûlkirin, lê gava mesele dibe kurdî qebûl nakin."
*MA*

# Li çanda deqê Xwedî derdikeve

**Fatma Temel ku hewl dide çanda deqê ya bi hezarê salan biparêze dibêje, ez dixwazim çanda deqê bidomînim û bigihînim nifşên nû.**

Nexşên ku li Kurdistanê bi navê 'Deq' tê naskirin, her yek ji wan xwedî wate û bandorekê ye. Ji serdema antîk û vir ve mirovan deq li bedena xwe danîne; jiyana xwe ya civakî, bawerî, lehengî, serbilindî, qewmê xwe, kêfxweşî û parastina ji nebaşiyê, bi deqkirina nexşên cuda nîşan dane. Ev çanda ku li ber windabûnê ye li Amedê ji nû ve kete rojevê.
Fatma Temel, deqên ku li ser bedena pîrka xwe dît, ji bo bigihîne nifşên nû hewl dide. Temel diyar kir ku ji xwe dest bi deqkirinê kir û roj bi roj bi ceribandina nîşaneyên cuda xwe bi pêş xist.

**HER NEXŞEK XWEDÎ WATEYEKÊ YE**

Temel diyar kir ku deq li bedena mirovan tê çêkirin û bi şîrê dayikê û derziyê tê neqişandin. Temel ragihand ku her nexşa ku tê deqkirin xwedî wateyekê ye û bi bîr xist ku ev çand ne tenê ya gelê Kurd e.
Temel anî ziman ku li Kurdistanê jin bi giranî deqê çêdikin, lê mêr jî li bedena xwe dixin û got, "Li gorî herêman nexşê tê guhertin. Mirov wateyên cuda dide van nexşan. Mirov bi giranî nîşaneyên ji qewm, eşîr an jî malbata xwe çêdikin. Her wiha hinek hene ku ji bo pêşî li nexweşiyan bigirin deq dikin."

**MIN LI GUNDÊ XWE DEST PÊ KIR**


Temel li ser mijara xwedîderketina li çanda deqê û gihandina ji nifşên nû re wiha axivî, "Ez ji Mêrdînê me. Li nava malbata min kêm jî be lê li derdora min min gelek mirov dît ku deq li xwe kirine. Min destpêkê hewl da fêhm bikim bê deq çi ye û wateya nexşan çi ye. Li ser deqê min nivîs xwend, li dokûmanteran temaşe kir. Beriya ku dest bi lêkolînên xwe bikim, ji min hebû ku deq jî yek ji rêbazên makyajê yê berê yê jinan e. Piştî ku bi kesên deq kirine axivîm, min fêhm kir ku tiştekî taybet e. Pitre min jî dest pê kir. Bala ciwanên li gund kişand û min dest bi deqkirina bedena wan kir. Dema ku ji bo xwendina zanîngehê hatim Amedê, min dît ku li vê derê jî gelek kes dixwazin deq bikin."

**ATOLYEYA JI BO PARASTINA ÇANDÊ**

Temel anî ziman ku wê dît çanda deqê li ber tunebûnê ye, lewma pêwîstî pê dît ku xwedî li vê çandê derkeve û got, "Ji bo ev çand winda nebe min atolyeke vekir." Temel got, "Herî zêde jin têne vê derê. Armanca min a esasî ew e ku vê çandê bigihînim nifşê ciwan. Carna xwendekar tên dibêjin ku li ser deqê tezê amade dikin. Bi vê wesîleyê hin tiştan ji wan hîn dibim. Dixwazim ku kûrsên deqê vekim û bi hevalên ciwan re bixebitim. Bi mirovên extiyar re jî dixwazim çavkaniya dîroka deqê hîn bibim. Têkildarî çanda Kurd dixwazim tiştekî destnîşan bikim."
*ANF*



## Jin û mêranî



Sîpan Şînda

Di nava civakê de malbat wek bingeh tê ditin û bingehê malbatê jî, ji aliyê jin û mêr ve tê danîn. Mirov dikare jiyanê bike du beş; ji beriya zewacê û piştî zewacê. Jiyana ji zarokî heta mirov tê li ber zewacê xweserî û taybetiyên xwe hene. Lê belê piştî ku mirov kete nava zewacê êdî jiyaneke nû dest pê dike. Du mirov bi girêdaneke ji ya di navbera xwih û biran de, ya dê û bav û zarokan de, ya di nava hevalan de cudatir bi hev ve têne girêdan. Êdî heq û hiqûqê du mirovan di jiyanê de bi hevve girêdayî dibe û ew ji divê li wê gorê tevbigerin. Du kes him bi awayê fizîkî, him bi yê derûnî, him bi yê civakî, him bi yê dadî, him bi yê aborî û hwd bi hevve têne girêdan. Jiber wê têkiliyên di navbera wan de ji tevilhevin û berpirsiyarî di stûyê herdu aliyan de ye. Yek nikare berpirsiyariyê bêxe di histûyê yê/ya din de û xwe ji ber bide alîkê. Jiber ku di serî de ew dibin "malbat" û êdî têkiliyên wan yên civakî têne guhertin. Ya duduyan, ew du mirov êdî biryarên xwe li gorî yekûdu didin û weke berê nikarin bi serê xwe tevbigerin. Ji xwarin û vexwarina wan bigire hetanî cil û bergên wan, ji demê hatina wan ya malê bigire hetanî çûna wan ya gerê û siyahetê her tiştê wan li gorî hevdu tête iyarkirin.
Di nava têkiliya wan her du kesan de divê di serî de rêzgirtinek du alî hebe. Hijêkirin li aliyekî, girêdana wan ya giyanî û mejî, sedeqeta wan ya li himberî hevdu şêwazê têkiliya wan ji diyar dike. Rêz û risima di navbera wan de, axaftinên wan yên li himberî hevdu, durustiya wan, niyeta wan ya li himberî hevdu şiklê têkiliya wan û pêşeroja zewaca wan, van diyar dike. Dema ji du aliyan yek li himberî aliyê din derewan bike, bê rêziyê bike, bê sedeqetiyê bike wê demê mafî dide aliyê din ji ku heman tiştan bike. Jin be mêr be ferq nake, dema yekê bi awayekî dest bi fêhlên xirab kir, di rastiyê de ew qumberekê di binê temelê malbatê de datîne û bingehê malbatê ji binî di hejîne. Ji ber wê divê jin û mêr sê tiştan jibîr nekin: Yek, li himberî hevdu durust bin. Dudu, sadiqê hevdû bin. Sê, li himberî hevdû bi rêz û edeb bin. Heke ew van sê tiştên henê bi jin û mêrekêre hebin, jixwe ew tiştên din wê pêve bêne û wê demê bingehê malbatekî saxelem hatiye danîn. Di têkiliya jin û mêrantiyê de çi dibe bila bibe, divê herdu alî ji heqaretê li hevdû nekin û bikaribin bi awayeke medenî pirsgirêkên xwe çareser bikin.
Dema zarokên malbatekê çêdibin, berpirsiyariya jin û mêrî girantir dibe û girêdana wan ji zêdetir dibe. Piştî ku zarok çêbû, divê jin û mêr têkiliyên xwe liber çavan re bibûrînin û heke kêmasiyek hebe divê ji halê rakin. Jiber ku ewê zarokan mezin bikin û rêz û risimê nîşanî wan bidin. Heke têkiliya dê û bavan nexweş be, ew zarok jî li gorî têkiliya dê û bavên qalibê xwe digirin. Bi taybetî ji zaroka ewil di vî warî de gelekî di bin bandora têkiliya dê û bavê xwe de dimîne.
Bêguman di nava her malê de pirsgirêkin wê hebin. Lê belê ya girîng ewe jin û mêr bikaribin pirsgirêkên di nava xwe de dilê hevdu ne hêlin û çareser bikin.

# Nivîsgeha Têkiliyên Giştî du malbat li hev anîn

**Nivîsgeha Têkiliyên Giştî ya Hêzên Ewekariya Hundir ya Herêma Cizîrê du malbatên ku berî mehek û nîvê nakokî di navbera wan de derketibûn, li hev anîn.**







Nakokiya di navbera malbata Qertemînî û Celî de ji beriya mehek û nîvê de ye, sedema wê jî şer di navbera ciwanên her du malbatan de derket, yek ji malbata Celî hate kuştin û yek ji malbata Qertemînî jî birîndar bû.
Merasîma lihevanînê li Hola Nûbela ya bajarê Qamişlo hate lidarxistin.
Bi sedan şêniyên bajêr, nûnerên Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê, Têkiliyên Gitşî ya QSD`ê, Kongreya Îslama Demokratîk, Meclisa Malbatên Şehîdan, rûspiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, PYD`ê, TEV-DEM, û şêxên eşîrên Ereb û Kurdan beşdarî merasîmê bûn.
Bi navê Nivîsgeha Têkiliyên Giştî ya Hêzên Ewekariya Hundirîn Dewran El-Haşimî axivî, bixêrhatina beşdaran kir û got: "Di demekê de ku gelê me ji bo pêkanîna projeya xwe ya jiyaneke bi rûmet û serferazî, hezkirin û aştî dixebite, em dibînin ku hêzên şer û tarî ji bo têkbirina hewldanên me, jihevxistina me û reşkirina projeya me li hev dikin."
El-Haşimî ev li gotina xwe zêde kir: "Bêyî hevgirtin, yekitî û derbaskirina hemû nakokiyan, ne mumkin e ku em bigihêjin armanc, mafên xwe yên rewa û parastina destkeftiyên xwe bikin."
El-Haşimî spasiya her du malbatan kir û wiha gotina xwe bi dawî kir: "Em di Hêzên Ewlekariya Hundirîn de vê gavê li gelê xwe pîroz dikin û wekî serkeftinekê di qada felsefeya biratiya gelan û jiyana hevbeş de û serkeftinek di qada exlaqê de dinirxînin. Di heman demê de em lihevhatina civakî wekî efsaneyeke qehremane bi nav dikin ji ber ku girîngiya wê ne kêmî girîngiya serkeftin û lehengiya ciwanên me yên li eniyên şer e."
Endamê Desteya Rûspiyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hekem Xelo jî axivî û got: "Vê civînê hemû pêkhateyên civakê û mezheban anîn gel hev, wekî pêşeroja Sûriyê bi giştî ye, ji lewma em vê civînê li tevahiya gelên herêmê pîroz dikin û hêvî dikin ku di hemû boneyan de bibe mînak da ku civakeke biewle û îstiqrar were misogerkirin."

### "BIRATIYA GELAN PLANÊN LI DIJÎ HERÊMÊ TÊK BIRIN"

Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Xweser a Herêma Cizîrê Telat Yunis axivî û got: "Di demekê de ku Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji hemû aliyan ve rastî êrişan tê û bi kiryarên bi armanca têkbirina projeya wê ya demokratîk re rû bi rû ye, ev civîn serkeftineke rasteqîn a gelê herêmê ye."
Yunis diyar kir ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hevgirtin û yekitiya xwe, gelek planên li dijî herêmê têk birin û wiha axivî: "Hişmendiya hezkirin û biratiya gelan a di navbera me de wekî bersiva hemû astengî û êrişên li ser herêmê ye. Li kêleka Rêveberiya Xweser rola komîteyên lihevhatinê û şêxên eşîrên Ereb û kurdan jî di belavkirina aştiyê, fikireya biratiya gelan a li herêmê de hebû."
Yunis da zanîn ku Rêveberiya Xweser dê bi armanca garantiya ewlehî û aramiya herêmê, kar û xebatê berdewam bike û parastina gelê xwe ji êrişên derve û hundirîn bike, hemû hewcedariyan dabîn bike û bi yekitî û biratiya gelan, tevahiya planên li dijî herêmê têk bibe.
Di dawiyê de şêx Fehed Deqorî belgeya lihevanînê xwend û tê de ev hate destnîşankirin: "Piştî çend hevdîtinên di navbera kesên erkdar û aliyên bi nakok de. Her du malbatan li ser van xalan li hev kirin, wefata kesê ji malbata Celî emrê xwedê ye ev jî li gorî wesyeta ciwanê wefat kiriye ji malbata xwe re ye. Birîndarkirina kesên ji malbata Qertemînî jî wekî bertekê were dîtin."
***ANHA***

# Girtîgeha Xiwêranê...pêşbînî û daxwazî



**M.Emîn Sadûn**

Tişta xuya û nabe cihê gengeşe û nîqaşê, ew e ku pîlangeriya qirêj ya li ser girtîgeha Xiwêranê bi destê Hêzên Sûriya Demokratîk hat pûçkirin û bingor bû. Herwiha terorîstan armancên xwe bi dest xwe ve neanîn. Ew pîlangeriya ku tevna wê bi destê hêz û istixbaratên çend dewletên serdest û herêmî hatibû danîn û ristin bi ser neket.
Lê tişta balkêş di van rûdan û bûyeran de tayê wê yê zirav hat dîtin û pey re rewşin nependî hatin xuyakirin, ew bû ku piraniya gelê Herêmê, bi tevahiya ol, netewe û pêkhateyên xwe ve, piştgirî û piştevanî dan oprasyona Gurzê Gelan ya Hêzên Sûriya Demokratîk ragihandî û her yek li gorî hêz û şiyana xwe palpiştî da oprazyonê û deverên xwe parastin. Wek hêzeke piştevaniyê cihê xwe di nava wî şerî de girtin û bi hişyarî bi rola xwe ya berpirsyar rabûn. Kanalên ragihandinê pir çalak bûn û tora mîdya civakî jî piştekeke hêzder û dilxweşker bû û rastî û moral bilin dikirin û dost û hevalbendên Rêveberiya xweser jî dest hilanîn û kêmayî nekirin. Jixwe gelê me bi tevayiya çînên xwe ve, herwiha bîr û hizrên xwe yên siyasî yên cuda cuda jî, bi kûrayiya metirsiya vê plangeria sîstematîk gihan û bi roleke erênî û pozîtîv rabûn. Herwiha helwestên zelal ragihandin û ji hêzên kurdî yên di nava itîlafa Ixwancî ya şovînî û terorist de, xwestin ku helwesta xwe eşkere bikin û dan xuyakirin ku ev hêza regezperest ajandeyên dewleta tirkî pêk tîne û tiştekê wê û gelê Sûriyê bi hev re nemaye. Ji ber vê rewşa cuda û balkêş di vê qonaxa hestiyar de, ji her wextî pirtir tê xwestin ku yek li rewşa xwe ya navxwe û hundir vegere û ji nêzîk ve li ser nakokî û hevrikiyên civakê raweste. Ji ber wê pêwîst e, Ceneral Mezlûm Ebdê, fermandarê Hêza Sûriya Demokratîk, plana stratejieke nû ragihîne û gav in dîtir bavêje û bi kûrbûnî û hûrbûnî li ser qonaxa piştî vê bûyerê bisekine û rêyên çareseriyan li pêşiya lihevhatin û hevgirtina gelan xweştir bike û ji nêzîk ve tevlî êş, jan, derd, aloziyên gel û pirsgirêkên civakê bibe û ji wan pisgirêk û aloziyan re li çareseriyên cidî bigere.
Qonax pir balkêş û metirsîdar e û gel bi wî û hêza ku ew pêşengiya wê dike jî bawer e û pêwîst e em bidin zanîn ku sînor û derfet ji bawerî û xweragirtinê re heye û divê her yek vê rastiyê jî bizane û berçav bigire û vê derfeta zêrîn ji dest xwe bernede.

# Şêniyên taxa Şêxmeqsûd li hemberî dorpêça hikumeta Şamê hewl didin debara xwe bikin

**Welatiyê bi navê Hemo Şêx Hemo li taxa Şêxmeqsûd hewl dide bi çandina sebzeyan di cihekî piçûk de li kêleka mala xwe, debara jiyana xwe bike, da ku bandora dorpêça hikumeta Şamê ya li ser taxê sivik bike.**

Hikumeta Şamê bi dorpêça li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê yên Helebê hewl dide rê nede ku madeyên bingehîn ên wekî ard û sotemenî bikevin taxan.
Şêniyên taxê jî li nêzî malên xwe an jî li ser banê xaniyan çandiniyê dikin.
Bi sedan şêniyên taxê ji bo dabînkirina pêdiviyên malê, ji ber dorpêça ku hikumetê ferz kiriye, li malên xwe sebzeyan diçînin. Welatiyê bi navê Hemo Şêx Hemo jî li ser banê mala xwe li Kolana Zihûr hin cure sebze çandine.

### 'EMÊ LI HEMBERÎ DORPÊÇÊ LI BER XWE DIDIN'

Hemo wiha dibêje: "Em ji ber dorpêçê gelek zehmetiyan dikişînin, ji ber wê jî em li malên xwe sebzeyan diçînin da ku pêdiviyên xwe yên malê dabîn bikin."
Hemo destnîşan kir ku sebze pir buha ne, ji ber şert û mercên zehmet ew nikarin sebzeyan bikirin, lê ruxmî wê jî ew li hember dorpêçê li ber xwe bidin. Hemo anî ziman ku ew ji bo debara malbata xwe sebzeyan diçîne û got: "Her roj em ji van sebzeyan dixwin."
Hemo di dawiya axaftina xwe de destnîşan kir ku ew ê li hemberî dorpêça hikumeta Şamê bisekinin û bang li rêxistinên mafên mirovan û navneteweyî kir ku zextê lê bikin da ku dorpêça li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rawestîne.
***ANHA***



## Ji êrişa ser girtîgehê kî berpirs e?



**Dilyar Cizîrî**

Çeteyên DAIŞ'ê di roja 20'ê çile de, di çarçoveya planeke mezin de êrişî girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêran ya Hesekê kirin. Ji saetên pêşî yên êrişê ve diyar bû istxbaratên welatan li pişt êrişê ne. Paşê QSD'ê jî di daxuyaniyên xwe de got ku di serî de dewleta Tirkan û hin aliyên din li pişt êrişê ne.
Baş bû şervanên QSD'ê û Hêzên Ewlekariya Hindir di cih de destwerdan kirin û rê li pêşiya belavbûna DAIŞ'iyan girtin. Ev berxwedan û têkoşîna şervanên QSD'ê ku bi navê Gurzê Gelan pêk hat, evsaneyeke din li dîroka gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê yên li ser esasê hevgirtin û biratiya gelan xwe birêxistinkirin, zêde kir.
Lê tişta balkêş gelek sazî û dezgehên ragîhandinê hewl dan û hê jî didin QSD'ê sûcdar nîşan bibin û bêjin ev hêz nikare parastina girtiyên DAIŞ'ê bike. Di raporên xwe de gelek idîa û nirxandên ne di cih de anîn ziman. Bêguman ew saziyên ragihandinê jî beşek ji plana dijminane ya DAIŞ'ê ku li dijîj girtîgeha Xiwêran pêk hat.
Ji ber wê jî min xwest hin xalan di vê derbarê de zelal bikim. Ya girîng ku pêwîst e were gotin, 12 hezar girtiyên DAIŞ'ê û kampên koçber û penaberan jî encama hemleya Koalisyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê ne. Ji wan zêdeyî 4 hezaran di girtîgeha Sînaa ya li taxa Xiwêran hatibûn bicihkirin. Ev ên di vê girtîgehê de çeteyên çek hilgirtibûn û destê wan di xwîna bi dehzaran kesî de heye.
Koalîsyona Navdewletî baş rewşa girtîgehê dizane, yê ji parastin û ewlehiya wê û girtiyan berpirsyar bû, hêzên Brîtanî yên di çarçoveya Koalîsyonê li herêmê ne. Li aliyê din hêzên Fransî di çarçoveya Koalîsonê de ji berhevkirina agahî û mijarên istxbaratî ve berpirsyar in. QSD'ê jî li ser vî esasî bi şervanên xwe parastina girtîgehê dikir. Jixwe şervanên QSD'ê ji ber rewşa herêmê û êrîşên dewleta Tirkan û gefên şaneyên razayî belav bûne û her di nava şer de ne. Ev dibû sedem QSD'ê nikaribe bi hezaran ji bo parastina van girtiyan veqetîne.
Li gorî agahiyên ji çavkaniyên payabilind hatin wergirtin, ev demeke ne hêzên Fransî û ne jî hêzên Brîtanî di mijarên agahî û raporên xwe yên derbarê Girtîgeha sîna aya taxa Xiwrêan de bi QSD'ê re par ve ne dikirin. Ev bû sedem valatiyek mezin di mijara parastina girtîgehê de derkeve.
Yê ji wê valatiyê sûd girtin, dewleta Tirkan ku bi hemû hêza xwe piştgiriya êrîşê kir. Herwiha çeteyên DAIŞ'ê yên êriş pêk anînbûn. Dibe mirov bibêje heger qisûrîk hêzên QSD'ê di vê derbarê de çêbûbe jî bêderfetî û kêmimkanî ye. Di heman demê de êrîş û gefên dewleta Tirkam yên li ser herêmê rê nadin şervanên QSD'ê xwe ji şerê li dijî şaneyên veşartî yên DAIŞ'ê û parastina girtiyên wan, her wiha kampên malbatên wan wekî Holê re vala bibin.
Lê careke din jî şervanên QSD'ê û hêzên Ewlekariya Hundir bi hemû hêza xwe karîbûn hemleya Gurzê Gelan bi ser bixin û Evsaneyên Ristemê Zal bi gurzê di destê xwe di dîrokê de xêz kir, dubare bikin.
Tişta niha pêwîst e mirov bi bîr bixe, divê Koalîsyona Navdewletî û di serî de Amarîka, Fransa û Birîtaniya erka xwe wekî serkêşên Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ'ê pêk bînin. Divê baş bizanin, parastina girtîgehan û tinekirina şaneyên DAIŞ'ê bi pêkanîna aramî û çareseriya siyasî ya di herêmê de pêk tê. Ev jî di naskirina rêveberiya xweser re derbas dibe.



# HPG: Êrişên dewleta Tirkî ya dagîrker yên 29'ê Çileyê bêencam bûn

**HPG`ê Li ser êrişên Dewleta tirkî ya dagîrker yên 29'ê Çileyê yên ser Herêmên Parastinê yên Medya daxuyaniyek da û da zanîn ku êriş bêencam bûn.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser êrişên hewayî yên dewleta Tirkî ya dagirker daxuyaniyek da.
HPG'ê di daxuyaniya xwe de ragihand ku artêşa Tirkî ya dagirker 29'ê Çileyê êrişeke giran ya hewayî ser Herêmên Parastinê yên Medya pêk anî. Lê bi êrişên xwe nekarîn ti encamê bi dest bixin.

### HPG'ê Herwiha li ser êrişên ev agahî da:

"29'ê Çileyê saet di navbera 12:30-12.50'î de li herêma Zapê qada Gundê Fileha bi balafirên şer 16 caran hate bombekirin.
29'ê Çileyê saet di navbera 12:30-12:40'î de derdora Girê Hakkarî yê ser bi herêma Metînayê, 6 caran bi blafirên şer hate bombekirin.
29'ê Çileyê saet di navbera 19:00-20:00 de li herêma Zapê qadên Kunîşka, Karker, Şehîd Şahîn û Saca bi balafirên şer 9 caran hatin bombekirin.
29'ê Çileyê saet di 20:15'an de qada Werxelê ya herêma Avaşînê bi balafirên şer hate bombekirin."






# Li Girtîgeha Boluyê jî girtiyek hat kuştin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Mehmet Hanîfî Bîlgîn ê ku 29 sal û 5 mehan li Girtîgeha Tîpa F ya Boluyê dîl gîrtî hat qetilkirin.
Mehmet Hanîfî Bîlgîn ê li Girtîgeha Tîpa F a Boluyê girtî bû, 30 miha çile şehit ket. Rêveberiya girtîgehê ku telefonî malbata Bîlgîn kir û îdîa kir ku "ji ber krîza dil" jiyana xwe ji dest daye. Cenazeyê Bîlgîn ji bo karên otopsiyê birin Saziya Tiba Edlî (ATK) ya Enqereyê.
Malbata Bîlgîn ji bo cenaze wergirin ji Çewlikê çûn Enqereyê. Parlamenterê HDP'ê yê Çewlikê Erdal Aydemîr û parêzerê Komeleya Hiqûqnasên Ji bo Azadiyê (OHD) Şaxa Enqereyê û Kenan Maçoglû jî bi malbatê re çûn ber ATK'ê.
Hat diyarkirin ku piştî karên otopsiyê, wê cenazeyê Bîlgîn bibin bajarê wî.
Bîlgîn ê ku qeyda wî li ser navçeya Dara Hênê ya Çewlikê bû, tenê 5 meh mabû ku bê berdan. Hate zanîn ku Bîlgîn, 3 sal berê niha carekê krîza dil derbas kiriye.



# QSD`ê nasnameyên 13 şehîdên din jî eşkere kirin

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

**QSD`ê nasnameya 13 şervanên xwe yên 22`ê Çileyê di operasyona dijî çeteyên DAIŞ`ê de li girtîgeha Sînaa ya li Hesekê şehîd bûn, ku didû ji wan biraiyê hevin eşkere kir.**

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) li ser malpera xwe ya fermî navên 13 şehîdan ragihandin. Herwiha di daxuyaniyê de soza pêkanîna armancên şehîdan hate dayîn.
Daxuyaniya QSD'ê ya li ser ragihandina şehidan wiha ye:
"Di berxwedana li hember êrişên çeteyên DAIŞ`ê yên li ser girtîgeha Sînaa de 13 hevalên me şehîd bûn. Çeteyên DAIŞ`ê bi piştgrî û desteka dewleta Tirkiyê ya dagîrker êrişî girtîgeha sînaa ya li Hesekê û Taxên wê kir. Hêzên me jî ji bo sekna li hember wan êrişan, pêngava "Gurza Gelan" ragihand.
Di çarçoveya pêngavê de û piştî şerên dijwar bi çeteyên DAIŞ`ê re, bi saya berxwedana şervanan, êriş têk çûn û armancên dagîrkeran bi ser neketin. Di vê berxwedanê de, 13 hevalên me şehîd bûn ku di nav wan de du birayên hev hene.
13 şehîdên ji pêkhateyên kurd û ereb, îsbat kirin ku bi hevgirtina xwe dikarin êrişan têk bibin. Careke din heta pêkanîna armancên şehîdan, em ê têkoşîn û berxwedana xwe ya li hember êrişên li dijî herêmên me li ber xwe bidin. Em soz didin ku destkeftiyên şehîdan biparêzin. Em sersaxî didin malbatên şehîdan û gelê xwe.
Nasnameya şehîdan wiha ye:
Nasnav: Heyder
Nav û paşnav: Ehmed El-Tebxan
Navê dayîkê: Zarîfe
Navê bav: Iyade



Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Ehmed Hesekê
Nav û paşnav: Ehmed El-Tawîl
Navê dayîkê: Ruqeye
Navê bav: Hiwêdî
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Argeş Bakok
Nav û paşnav: Îsmaîl Ehmed
Navê dayîkê: Xelûf
Navê bav: Xilêf
Cihê ji dayîkbûnê: Şedadê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Zinar Qamişlo
Nav û paşnav: Ciwan Hemê
Navê dayîkê: Îlham
Navê bav: Nîdal
Cihê ji dayîkbûnê: Qamişlo
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Zana Hesekê
Nav û paşnav: Ehmed Silêman
Navê dayîkê: Sûmeye
Navê bav: Salih
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Serhed Hesekê
Nav û paşnav: Ednan Xilêf
Navê dayîkê: Erne
Navê bav: Ebas
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Şukrî
Nav û paşnav: Şukrî El-Doman
Navê dayîkê: Neşîme
Navê bav: Wadî
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Egîd El-Igêdî
Nav û paşnav: Ebdulrezaq Ibêd
Navê dayîkê: Dahiye
Navê bav: Îsa
Cihê ji dayîkbûnê: Ceza
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Egîd Hesekê
Nav û paşnav: Ehmed Salih
Navê dayîkê: Cemîle
Navê bav: Îd
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`yê Çileya 2022`iyan

Nasnav: Egîd Hesekê
Nav û paşnav: Mihemed Silêman
Navê dayîkê: Henûf
Navê bav: Elî
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Baz Qamişlo
Nav û paşnav: Mihemed Xelef
Navê dayîkê: Semîra
Navê bav: Ebdulqadêr
Cihê ji dayîkbûnê: Tirbespiyê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an


Nasnav: Hemze
Nav û paşnav: Mihemed El-Tebxan
Navê dayîkê: Zarîfe
Navê bav: Iyade
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an

Nasnav: Mezlûm Hesekê
Nav û paşnav: Sadam Sibêh
Navê dayîkê: Sabha
Navê bav: Hisên
Cihê ji dayîkbûnê: Hesekê
Cih û dîroka şehadetê: Hesekê 22`ê Çileya 2022`an"

# `Ne rêberê Kurdan tenê ye, rêberê mirovayiyê ye`

## Benjewîn Elî: Armanca Tirkiyê ji tecrîdkirina Rêber Abdullah Ocalan tinekirina projeya Neteweya Demokratîk e.

**Darîn Silê/Qamişlo**



23 sal in Rêber Abdullah Ocalan li zindana Îmralî di tecrîdeke giran de ye. Dewleta tirkî û hêzên emperyalîst ku aligirên vê komployê bûn, xwastin gelê Kurt ji felsefeya rêbertiya wî qut bikin û nasnameya hebûna vî gelî ji holê rakin. Lê têkoşîna Rêber Apo ya li dijî van armancên dijminên Kurdan Komloya Navnetewî vala pûç kir, serhildanên gel û têkoşîna azadiya Kurdan xurttir bû. Rêber Apo sîstema xwe ya Neteweya Demokrat bi pirtûkên xwe ragihand raya cîhanê û têkoşîna azadiya gelê Kurd bû rojeva cîhanê. Ji bo wê jî Tirkiye bi salan e tecrîdeke giran li ser rêbertiyê bi kar tîne. Roj bi roj tecrîdê girantir dike û derfetê nade malbat û parêzerên wî pê re biaxivin. Herî dawî 25'ê Adara 2021ê Rêber Abdullah Ocalan bi telîfonê bi birayê xwe Mihemed Ocalan re axivî, lê piştî çend deqeyan axaftin hat qutkirin û ji wê demê ve ti agahî jê nehatina girtin.

Derbarê mijarê de endama Rêveberiya Navenda Pêwendiyên Diblomasiyê ya Kongreya Star Benjewîn Elî da zanîn ku armanca Tirkiyê ji tecrîdkirina Rêber Apo, tinekirina projeya Neteweya Demokratîk e û axaftina xwe wiha domand: "Dewleta Tirkan ya dagîrker dixwaze destkeftiyên gelê Kurd têk bibe, herwiha projeya Neteweya Demokratîk û biratiya gelan bêbandor bike. Yê ev proje danî rêbertî bû. Ji bo wê jî naxwazin ji zindanê derkeve, da ku gelê Kurd mafê xwe bi dest nexe û Kurdistaneke azad neyê avakirin. Em jî dibêjin em şagirtên Rêber Apo ne. Ew çiqas tecrîdê giran bikin û êrişan zêde bikin, emê jî li hemberî wê hê zêdetir gavan biavêjin.

Ti kes nikare me ji rêberê me qut bike û wê têkoşîna me bênavber dewam bike. Emê her roj dengê xwe bigihînin sazî û rêxistinên navneteweyî da ku rêberê xwe ji zindanê azad bikin."

Benjewîn Elî got, Rêber Apo civakeke bihêz ava kir. Gavên Rêber Apo bi berxwedanê dest pê kirî, em jî wê berdewam bikin. Fikir û ramanê Rêbertiyê ne di nava gelê Kurd tenê de ne, di nava tevayiya pêkhateyan de belav bûne. Gelê Kurd, rojbiroj bi hêza rêbertiyê û bi xwîna şehîdan gavên mezin tir diavêje û di nava cîhanê de bûye xwedîhêz. Herwiha Rêbertî bandorekî xwe yê mezin li ser civakê heye, bi taybetî civaka kurd. Dewleta tirkî tevayiya hewildanên xwe bi kar tîne ji bo ku hêza kurdan lewaz bike. Bi ramanê rêber Apo şoreşek hatiye lidarxistin, ev şores wê bi mezinbûn dewam bike.



**`Rêbertî fikir û felsefeyeke`**

Benjewîn bîr xist ku dewleta Tirkî xwest Girava Îmralî bike dojeh, lê Serokatiyê ew zindan kir cihê zanistê, cihê avakirin û afrandinê û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Rêbertî fikir û felsefeyeke, heyfe ku rêbertî di zindanê de be. Li ser serokê ti welatî tecrîdeke wiha nehatiye çêkirin."

**Bêdengiya dewletên navneteweyî**

Benjewîn Elî behsa bêdengiya dewletên têkildar jî kir û wiha got: "Dewletên serdest li hember tecrîdê bêdeng in, lewre destê wan di girtina rêbertiyê de heye. Heriwha ji bo ku berjewendiyên xwe li ser xaka me pêk bînin, civak ji civakbûnê, mirov ji mirovatîyê dûr xistine û heskirina ax, welat û xwezayê ji dilê mirovan qut kirine. Herwiha Ji bo berjewendiyên xwe siyaseteke qirêj didin meşandin û di tecrîda girankirî ya li ser Rêbertî de şirîkin. Jixwe rêxistinên ku dibêjin em mafê mirovan diparêzin li hember rewşa rêber Abdullah Ocalan bêdengin. Em ji dewleta tirkî re dibêjin heta dawiyê emê li du rêberê xwe bin. Çimkî rêber Apo ne rêberê gelê kurd tenê ye, rêberê mirovayiyê ye."

Benjewîn Elî teqez kir ku tevî tecrîda ku li ser Rêbertî tê kirin, dewleta tirkî derfetê nade parêzer û malbata wî ku pêre biaxivin û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Li gorî pîvanên navnetewî yên mafê mirovan divê kesê ku di girtîgehê de rastî işkenceyê nebe. Herwiha mafê wî ye ku daxwaza hevdîtina malbat, parêzer û hevalên xwe bike û divê ji mafê xwe yê jiyanê qut nebe."

**`Em li hemberê tecrîdê bêdeng namînin`**

Endama Rêveberiya Navenda Pêwendiya Diblomasî ya Kongireya Star Benjewîn Elî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Emê bi fikir û felsefeya Rêbertî rêxistina xwe xurt bikin. Wek jinên bakur û rojhilatê Sûriyê û jinên azadîxwaz heta ku em rêberê xwe azad nekin em ranawestin. Çimkî hebûn û azadiya me girêdayî azadiya Rêberê me ye."

# 'Civînên Tirkiyê yên berî niha bi çeteyan re serkêşiya wê ji êrişa DAIŞ`ê re eşkere dikin'

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

**Ehmed Karamus: Êrişa ser girtîgeha Xiwêran, hevbeş bû. Di bingeh de dewleta Tirkiyê ya dagîrker êrişkar bû û di bin cil û tîpên DAIŞ`ê de êrişa xwe pêk anî; xwest bi vê êrişê dagîrkeriya xwe berfireh bike.**

**Serkêşiya Tirkiyê ji êrişa ser girtîgehê re**

Li ser êrişan çeteyên DAIŞ`ê yên ser girtîgeha Xiwêran ya Hesekê, Hevserokê Kongera Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) Ehmed Karamus ji me re axivî.

Karamus bal kişand ser ziraviyên plan û êrişa DAIŞ`ê yên ser girtîgehê û ev niraxdin kir: "Di êrişê de DAIŞ ne bi serê xwe bû. Lewra êriş bi ziravî hatibû plankirin. Dema mijar dibe Rojava, bakur û rojhilatê Sûriyê, bêguman destê dewleta Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê DAIŞê di her êrişê de heye. Jixwe ya vê teqez dike civîninên Tirkiyê yên li Kilis, Dîlok, Riha, Serê Kaniyê û ya vê dawiyê li Enqerê, bi serokçeteyên DAIŞê û çeteyên din re pêk hatî bû."

**Rola rejima Sûriye û Iraqê**

Hevserokê KNK`ê diyar kir ku helwesta rejima Sûriyê ya li dijî vê êrişa DAIŞ'ê dide xuyakirin ku agahiyên wan ji vê êrişê heye û ev şîove kir: "Ev êrişeke hevbeş bû. Rejima Şamê jî tê de xwedîrol bû. Ne dûr e ku destê hikumeta Iraqê jî di vê êrişê de hebe. Lewra van rejiman berî êrişê çend civînên istxbaratî bi hev re pêk anîn. Ji aliyekî din ve ev rejimên destnîşankirî tev dijayetiya Rêveberiya Xweser dikin û ji bo jiholêrakirina wê tev digerin. Lê ya serkêşiya vê yekê dike dewleta tirkî ya dagîrker e. Jixwe kengê derfetê bibîne wê bi çeteyên xwe DAIŞê re êrişî vê statûyê bike."

**'Tirkiyê bixwe nîkarî êriş bike, bi awayekî feşartî û bi tîpên DAIŞ`ê êriş kir'**

Karamus da zanîn ku armanc û mebesta Tirkiyê ji êrişa ser girtîgehê ew bû ku her 5 hezar çeteyên ji milê leşkerî û şer ve xwedîezmûn, ji gertîgehê birevîne û wan li hemberî herêmê bi çek bike.

Karamus axaftina xwe wiha domand: "Dewleta tirkî xwest bi van 5 hezar çeteyan li seranserê Rojava êrişên berfihe pêk bîne û herêmê bixe binê kontrola xwe. Lerwa hewldanên dewleta tirkî ya dagîrker yên bi vî rengî hene. Lê ji ber rewşa siyasî ya navneteweyî nikarî êrişan bixwe li ser Rojava pêk bîne. Ji ber wê bi cendirme û istxbaratên xwe di binê kincên DAIŞê de êriş kir."

**`Rêveberiya Xweser li şûna cîhanê tevê şerê Terorê dike`**

Karamus herwiha bal kşand ser berxwedana QSD`ê û wiha axivî: "Plan û êrişeke mezin bû, lê QSD`ê ew şkandin. Jixwe dizanin ku çeteyên DAIŞ`ê yên niha di girtîgehên Rêveberiya Xweser de tev biyanî ne. Gelek ji wan ji welatên Ewropa, Kafkasya û ji Bakurê Afrîkayê ne. Tev bi agehdariya hikumetên xwe tevlî DAIŞ`ê bûne. Ev tê wateya ku pirsgirika çeteyan û darizandina wan pirsgirekeke navneteweyî ye. Lê ti dewlet erk û misyona xwe pêk naynin û paşguh dikin. Bi vê helwestê, ev dewlet ji aliyê hiqûqê, exlaqî û mirovî ve li hemberî erk û berpisyariya xwe sûc dikin. Rêveberiya Xweser li şûna cîhanê hem şerê DAIŞ kir û hem erkê parstina mirovayiyê radike ser milê xwe. Vêca slogan û pewvirên van dewletan man li kû?"



Ahmed Karamus teqez kir ku divê zext li ser van dewletên têkildar bê kirin ku welatiyên xwe yên DAIŞ`î bigirin û li cem xwe wan darizînin û bi vê bangê axaftina xwe qedand: "Ya girîng ew e ku divê statûya Rêveberiya Xwerser li cîhanê bê naskirin û piştgirya wê bê kirin."



Tirkiye-DAIŞ û plana Hesekê!

**Ahmet Aktaş**

Êrişa bi navê DAIŞ'ê ya 20 Çile li ser girtîgeha Sînaa ya Hesekê, bi dengvedanek mezin ket rojevê.

Bi piranî eşkere bû ku armanca vê êrişê ne girtîgeh tenê bû û DAIŞ jî ne tenê bû. Lewra hem ji agahiyên berê û hem yên di êrîşê de ji aliyê DAIŞ'iyên ketîm destê QSD'ê, zelaltir dibe ku dewleta tirkî bi riya MIT'a xwe, bi sedan kesên kujer, li Serê Kaniyê û Grê Spî perwerde kirine.

Herwiha hem li gorî agahiyên bi dest ketîn hem êrîşên berfireh û hevdem, eşkere vê plangeriya dewleta tirkî piştrast dikim.

Dîsa weke gelek caran, di gelek êrîşên bi van şêwazên ji aliyê vê dewleta terorîst ve hatine kirin de tê zanîn, di vê êrîşê de jî diyar dibe. Ev jî di rojêk nasyar de; roja 20-21'ê Çile (2014) ya ragihandina her 3 Kantonên Rojava(Kobanê, Efrîn û Cizir) û Rêveberiya Xweser e.

Li vira aşkere tê dîtin ku armanc, ne bi tenê derxistina kujerên terorîst ên DAIŞ'ê ji zîndanê ye, belê armanca bingehîn; hilweşandina Rêveberiya Xwesera Demokratî bi giştî ye.

Ji ber ku him berî ev êrîş, ji bo zeminxweşkirina vê êrîş û plana mezin; li pey hev bi dironan û topan êrîşî Kobanê, Minbicê, Eynîsayê, Tiltemirê, Zirganê û deverên din dikir.

Her wiha ji bo vê planê, ji aliyê Iraqê ve jî komên sed kesî amade kirine û di heman demê de xistine rê. Her wiha li Başûr jî bi taybetî li ser Qadên Parastina Medyayê, Mexmûr û Şingalê jî êrîşên xwe bê navber dewam kirin. Li Şingalê fermandarek û şervanekî YBŞ'ê jî şehid kirin.

Di vê êrîşa 20 Çile ya parçeyê plangeriya berfireh de, 2 xalên din jî yên giring hene. Yek; DAIŞ, him di navê xwe de him jî di dema despêka avabûna xwe de, ji ber ku armanca wê ya sereke hilweşandina Şoreşa Rojava bû, lewma ji roja ewil ve heta roja dawî, her armanca êrîşên wê yên bingehin di kesayetiya Şoreşa Rojava de, Tevger û Têkoşina Gelê Kurdistanê ye.

Dudu; di despêkê de, êrîşa xwe ya mezin di 15.9.2015 de bir ser Serêkaniyê, 4 miha dorpoça xwe ya hovane domand, lê şikest. Li Serekaniya Bakur(Ceylanpinar), AKP'ê hemû hêza xwe ya dewletî da xebitandin û bi zordarî Şaredarî ji destê HDP'ê derxist in.

Weke ku dewleta tirka, hîn jî li pey tolhildana şkestina xwe(DAIŞ'ê) ya Serêkaniyê û Kobanê be hewl dide!

Li aliyê din, di vî şerê dijî DAIŞ'ê de, raya giştî ya cîhanê jî maf dide HSD'ê û bi tevayî têkoşîna tevgêra Rojavayê. Heta di asta gelek dewletan de jî, bi hevpariya Hevpeymaniya Leşkerî ya li gel HSD'ê, piştgriya xwe bi awayekî aşkere nîşan didin. Lê di asta siyasî de li gel Rêveberiya Xweser ya peywendî ya, di asta herî lawaz de ye.

Ya herî mirovan hêrs dike, li gel durûtî û bêdengiyê, ya herî neyînî; têkilî û piştgriya bi dewleta faşîst û qirker a AKP-MHP'ê re ye.

Hema di helwesta li dijî êrîşa DAIŞ'ê a Hesîça/Hesekê de, bi HSD'ê re hevpar şerê şênber dan meşandin. Lê dîsa li kampa Holê û Sinaayê 7 hezar DAIŞ'iyên 54 welatan hene. Êdî di vî karî de nabe hevpar û alîkariyê nedin Rêveberiya Xweser! Divê di vê derbarê de rexneyên xurt li van dewletan werin kirin. Her wiha bêgûman, bi giştî hişyariyek ji berê xurtir lazime li dijî van planên terorizma dewleta faşîst a AKP-MHP-DAIŞ'ê!



# Di Gurzê Gelan De, Parastina Rewa

## Di destana 'Gurzê Gelan' de dayîk, jin û ciwanên Hesekê li kolan û taxên Bajêr, ji bo parastina xwe li gel şervanên QSD`ê tev geriyan. Vê yekê di asta herî jor de girîngiya pergala Xweparstina Rewa nîşanî cîhanê da.

**Serbest Etê/Hesekê**







Çetyên DAIŞ`ê 20'ê Çileyê êrişî girtîgeha Xiwêran ya bajarê Hesekê kir. Lê li hemberî vê êrişê Hêzên QSD, YPG-YPJ û Asayîşê rûpeleke zêrîn ya berxwedanê tevlî pirtûka azadiya gelan kirin. Li dervî dîwarên girtîgehê jî gelên Hesekê (Kurd, Ereb û Sûriyanan) di destana 'Gurzên Gelan' de parastina kolan û taxên xwe kirin.

**Dayîk, jin û ciwan Gurzê xwe li hemberî çeteyan bilind kirin**

Êrişa ser Girtîgeha Hesekê ya herî mezin ya çeteyên DAIŞê, piştî şkandina wê ya li Baxûza Dêrazorê bû. Ev êriş hişt ku dewletên xwediyên artêşên herî bihêz, tirsa xwe ragihînên. Lê tevlî QSD'ê, jin ,ciwan, kal û dayîkên Hesekê gotineke din bi destan û pergala xwe ya parastinê ji cîhanê re vegotin û li nava tax û kolan bajêr, xalên xwe yên ewleyiyê çêkirin û dest bi parastina xwe kirin.



Hevserokê Komîteya Xweparastin û Ewleyiyê ya Meclisa Bakur ya bajarê Hesekê Hecî Ebdusemed ji me re axivî û wiha got: "Ji destpêka êrişê ve şêniyên bajêr bi Kurd, Ereb û Suriyan xwe wek erk û hevkarî bi hêzên Asayîşê û QSD`ê re, li tevayiya taxên bajêr bi cî kirin û xalên xwe yên kontrolê li nava kolanan danîn. Ev jî asta bilind ya baweriya gel bi xweparastinê nîşan dide."

Hacî herwiha diyar kir ku ew tensîq û têkiliyê bi hêzên leşkerî dikin û xebata xwe birêkûpêkî pêk tînin û ev agahî da: "HPC vîn û hêza civakê ye, me karî nîşanî cîhanê bikin ku hêza gelan hêza serkeftinê ye. Jixwe me serkeftinên mezin û biencam bidest xistin. Lewra me karîbûn çend şaneyên çeteyan destgîr bikin."

**Gelên daîyk pêşeng bin wê serî daneynin**

Gurzê Gelan bê mohera dayîkan derbas nebû. Dayîkan li tenîştê şervanên QSD, YPG-YPJ û Asayîşê di berxwedanê de ciyê xwe girtin û taxên xwe parastin.



**'Em dayîk rê nadin çeteyan ku destdirêjiya deskeftiyên şehidên me bikin'**

Herwisa Dayîka bi navê Zekiya Mihemd ku li gel du jinan û ciwanekî bi erka xwe ya parastina rewa li taxa Muftî radibû ji me re wiha axivî: "Di êrişa DAIŞ`ê de hin şaneyên çeteyan ket dewrê û xwest ewelyiya bajêr û civakê tev bidin. Lê li hemberî wan em rabûn ser piyan û me dest bi parastina taxên xwe kir. Me xwe wek gel birêxistin kiriye û grûbên xweparstinê ava kirine. Her kes beşdar dibe û rola xwe tê de digire. Em wek dayîk jî rê nadin çeteyan vê eweliya ku bi saya xwîna şehîda ava bûye, tev bidin. Herwiha em heta dawî li tenîşt hêzên xwe wê li ser piyan bin û piştgiryê wan bikin."

**'Jin rê neda vegera hovîtiya DAIŞ`ê û wê bi rengê xwe berxwedanê bixemilîn e'**



Jina bi navê Sebah Reşîd jî ji Taxa Tela`i ye, ji destpêka êrişê ve bi hêzên civakê re li ser piyan e û taxa xwe diparêze. Sebah jî got, çeteyan xwestin xwe jinûve bi rih bikin, taritî û hovîtiya xwe jinûve belav bikin û ewleyiya bajêr têk bibin. Lê wek jinên vî bajarî emê her li tenîşta hêzên xwe yên leşkerî, li ser piyan bin. Emê ti carî rê nedin çeteyan ku ciyê xwe li vir çêkin. Me serî ji DAIŞ`ê re dananîn û emê daneynin. Herwiha serkeftin wê para gelên azadîxwaz be û wê şkestin para çete û hevkara wan Dewleta Tirkî ya dagîrker be."

Sebah herwiha bang li gelên bajêr kir ku parastina rewa bikin bingeh û li kolan û taxên xwe bêtir hişyar bin û rê ne din van çeteyan ku ewlehiya herêmê û bajar xerab bikin.

**'Xweparstina Erka me ye'**

Ciwanê bi navê Ehmed Mihemed Xidir di heman demê de destîşan kir ku ew wek ciwanekî Ereb ji destpêka êrişê ve wek erk; kolan, tax û bajarê xwe diparêze û wiha axivî: "Rola ciwanan xweparatinê de bigehîn e. Herwisa Hesekê bi gelên xwe dixemile û dijminên gelan dixwazin Biratiya Gelan bikin amanc. Lê wê gelên bakur û rojhilatê Sûriyê rê nedin lîstokên dijmin bi ser kevin."



# Bêdengî tê wateya hevkariyê

**Navenda Nûçeyan /Qamişlo**

**Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan Ihsan Şiblî bang li civaka navneteweyî kir ku sozên dayîn bi cih bîn in û sûcên dewleta Tirkiyê ya faşîst rawestînin.**

Gerîla ji 23`ê Nîsana 2021`ê ve li hemberî êrişên artêşa Tirkiyê ya dagîrker yên ser Herêmên Parastina Medya berxwedaneke dîrokî nîşan didin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG`ê ragihand ku artêşa dagîrker ji bo têkbirina vê berxwedanê di nava 6 mehan de 232 caran çekên Kîmyayî bi kar anîne. Herwiha HPG û KCK'ê gelek caran banga avakirina komîteyên navneteweyî yên serbixwe ji bo lêkolîna çekên kîmyayî yên ji aliyê dewleta dagîrker ya Tirkan ve tên bikar anîn, kir. Lê hêzên navneteweyî bêdeng man.

Endamê Meclisa Malbatên Şehîdan ya Girkê Legê Ihsan Şiblî, sûcên dewleta tirkîl ya dagîrker şermezar kirin û wiha axivî: "Sûcên dewleta tirkî ya dagîrker li Herêmên Parastinê yên Medya pêk tîne ne nû ne, dewleta tirkî ya faşîst xwediya dîrokeke xwîndar ya demdirêj e ku ji pêşiyên xwe Osmaniyan girtiye."

**'Berxwedana gerîla ji bo mirovayî û aştiyê ye'**

Şiblî da zanîn ku dewleta Tirkan di êrişên xwe de, siyaseta tinekirinê li dijî gelan dimeşîne; azadî û demokrasiyê dike hedef û axaftina xwe wiha domand: "Siyaseta qirkirinê ya li dijî Kurdan hê jî dewam dike. Dewleta Tirkan ya dagîrker ji bo ku hebûna xwe biparêze di êrişên xwe yên li dijî gerîlayan de çekên kîmyayî bi kar tine, lê wê nikarbe bighîje armanca xwe. Lewra gelê Kurd li ber xwe dide û gerîla di riya avakirina civakeke azad û demokratîk de berxwdaneke bêhempa raber dikin."

**'Gerîla nirx û dîroka gelê Kurd û tevayiya gelên Rojhilata Navî diparêzin'**

Şiblî diyar kir ku PKK di berxwedana xwe ya li dijî êrişên dagîrkeriya Tirkiyê de prensîba civaka azad kiriye bingeh û axaftina xwe wiha domand: "Gerîla nirx û dîroka gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî diparêzin û armanca wan xurtkirina Neteweya Demokratîk û biratiya gelan e."

Şiblî herwiha bal kişand ser girîngiya berxwedana dîrokî ya gerîla, ya ji bo azadiya gelên Rojhilata Navî û wiha axivî: "Berxwedana gerîla berxwedana li hemberî planên dewleta Tirkiyê yên ji bo vegerandina Împaratoriya Osmanî ye ku li dîjî gelên Rojhilata Navî tevan e û dixwaze plana xwe bi dagîrkirina xaka Kurdistanê pêk bîne."

**`PDK di êrişan de piştgiriyê dide MÎT'ê`**

Şiblî diyar kir ku êrişên dewleta Tirkiyê ya dagîrker yên li dijî gerîlayên li çiyayên Kurdistanê, êrişên li dijî doza gelê Kurd û neteweya demokratîk in û axaftina xwe wiha domand:"Dewleta Tirkiyê ya faşîst ji xistina navê PKK'ê ya "lîsteya terorê" sûdê digire û çekên kîmyayî li dijî gerîla û gundên Kurdan yên başûrê Kurdistanê bi kar tîne, lê mixabin PDK hevkariya dewleta Tirkiyê ya dagîrker dike û bûye alavek di destê MÎT`a Tirkiyê de."



**`Dewleta Tirkan ya dagîrker dixwaze tola DAIŞ`ê hilîne û hewl dide vejîne `**

Ihsan Şiblî diyar kir ku ji ber serkeftina gerîla li hemberî dewleta dagîrker, bi komên çete yên herî hov (DAIŞ'ê) xwast tola xwe hilîne û vê jî têrê nekir çekên kîmyayî bi kar anin."

Şiblî bang li civata navneteweyî kir ku li dîjî bikaranîna çekên kîmyewî ku ji aliyê dewleta Tirkiyê ve tên bikaranîn rawestin û got, bêdengî nîşan dide ku berjewendiyên hevbeş di navbera wan de hene. Ev berjewendî li ser kuştinê û xwîna gelan, xweza, dîrok û civakê hatine avakirin."



Enqere û Şam hêviya wan DAIŞ e

**Zekî Bedran**

Êrişa DAIŞ` ya ser Hesekê wê di nava deme de baştir bê fêmkirin. Êriş ne li ser girtîgehê tene bû. Li gorî ragihandina Xelîfetiya 2. hatibû plankirin. Yên ji girtîgehê reviyayîn eger li nava bajêr belav bibûna hem wê komkujiyên mezin bikiran, hem wê tevlîheviyeke mezin çêbûya. Weke din li herêmên din jî amadekariyên wan hebûne û wê ew jî biketana tevgerê. Lê tevgera QSD`ê ya bilez hem pêşiya komkujiyan hat girtin, hem plana DAIŞ`ê xerab bû. Bi destpêkirina bûyeran re QSD û hêzên koalisyonê bi awayekî bibandor dest li bûyerê werdan. Şer bi rojan dewam kir. QSD`ê û hêzên koalisyonê operasyoneke bidiqet kirin. Bi sedan çete hatin kuştin. Bi dehan şervanên QSD`ê şehîd bûn. Di gel şer û belavbûna çeteyan li malan û derdorê zerernetîtina sivîlan weke mûcîzeyekê ye. Pozê sivîlekî jî xwînî nebû. Çend sivîlên hatîn kuştin jî bi destê DAIŞ`ê hatine kuştin. DAIŞ bêguman ne pirsgirêka herêmên xweser e, tevayiya herêmê û dinyayê eleqedar dike. Jixwe ku ne wisa buya koalisyonê nediket nava meseleye. Bêbandorkirina DAIŞ`ê bi deste QSD`ê û koalisyonê be jî herî zêde ji bo rejimê baş e. Lewra Hesekê jî di navê de DAIŞ`ê herêmên rojhilat û bakurê Sûriyê xistibûn deste xwe. Leşkerên Sûriyê dişkandin û pêş diketin. Leşkerên rejime li Hesekê ji pêşiya DAIŞ`ê direviyan. QSD`ê DAIŞ şkand û bajar rizgar kir. Niha jî rejima Şamê radibe QSD û koalisyonê sûcdar dike. Qaşo sûcê şer kirine. Her tişt li holê ye, bi şaşîtî be jî sivîlek nemiriye. Gelo şerê li hemberî DAIŞ`ê şaş e yan sûc e. Yên li Şamê dixwazin çi bikin? Lewazkirina Rêveberiya Xweser û tevlîhevkirina herêmê ji xetera DAIŞ`ê girîngtir e?

Eger DAIŞ bi ser bikeve leşkerek tenê jî yê Sûriyê nikare li Hesekê bimîne. Weke din bi Şamê re li hev nayê û daxwaziya wê tevayiya desthilatdariyê ye. Li hemberî hêzeke wiha ji bo Sûriyê û dinyayê tevê tehlûke nêzîkatiyeke wiha erzan û propaganda enceq karê bêaqilan be. Wisa tê fêmkirin ku hin kesên dibêjin em rêveberiya Sûriyê ne li hin herêman pêşiya DAIŞ`ê vedikin û dixwazin derbasî herêmên xweser bibin. Hem li herêmê hem li dinyayê nakokiyên Rûsya bi Amerîka û dewletên Ewropî re hene. Derxistina van nakokiyan li Sûriyê barekî wisa ye ku ne Kurd nikarin rakin ne jî gelen herêmê. Welat roxiyaye. Bi milyonan mirova ketine rewşa xizanî û koçberiyê. Divê çareyek jê re bê dîtin. Lê Rûsya dixwaze dijberiya li hemberî Amerîka bide ser mile vî gelê birîndar. Rêveberiya Şamê jî xwê li birînê dike.

Ev siyaset ji DAIŞ`ê re cî vedike. Divê dev ji vê siyasete berdin. Divê ji bo yekbûna gelê sûriyê û sîstemeke demokratîk xebat bê kirin. Ev erk yê rêveberiya Şamê ye jî. Bêguman ya herî zêde dixwaze DAIŞ xurt bibe û destekê didiyê Tirkiye ye. El Nusra, DAIŞ û çekdarên din tev li herêmên di binê dagîrkeriya Tirkan de dimînin û serbest tev digerin. Ev herêm bi çeteyên ji aliye dinyayê ve terorîst hatîn qebûlkirin û her rengê sûcê şer kirin dagirtî ye. Herêmên di deste Tirkan de ji bû sûcdar û çeteyan bûye weke bihiştê. Li van herêman perwerde dibin û devera dixwazin diçinê. Çawa ku yên êrişî Hesekê kirin qismek ji wan ji van herêmên dagîrkirî hatine.

Lê tiştên dewleta tirkî dike ne ev tenê ye. Çawa ku tê zanîn dagîrkeriya tirkî bênavber êrişî Eyn Îsa, Til Temir, Minbic, Kobanê û deverên din dike. Ji ber wê QSD jî neçar dibe ji bo parastinê hêzê bibe wir û bala xwe bide ser wir. Di heman demê de bi herêmên di destê rejima Şamê de sînorê bi sedan km. heye. Parastina sînorekî dirêj dewletek jî nikare ji heq derkeve. Hêzên koalisyonê vê baş dizanin. Rûsya jî wisa. Lê digel wê ev hêzên mezin li hemberî dewleta tirkî nabin xwediyên helwesteke cidî. Bi qasî ku tê xwestin herêmên xweser destek nakin. Ji van firsetan jî ya herî zêde sûdê digire DAIŞ e. Her ku DAIŞ qezenc dike û herêmên xweser zererê dibinin ya qezenc dike dewleta tirkî ye. Tişta ku Tirkiye dixwaze bike bi DAIŞ`ê dide kirin. Dinya tev niha nîqaş dike û maye şaş. Dibêjin çawa DAIŞ dikare bi hêzeke wiha were Hesekê û êriş bike.

Dema DAIş`ê seyare teqand û xwest yên di hundir de derxe çend şervanên QSD`ê yên li ber derî lehengiyeke mezin kirin. Digel ku destpêkê şehîd çêbûn jî nehiştin çeteyek tenê jî di wir re bireve. QSD`ê bilez mûdaxele kir û tedbîr girtin. Avayiya ku çeteyan dîwar roxandîn û tê re derbas bûyîn avayiya girêdayî hikumeta Şamê bû. Ew der jî bilez hat dorpêçkirin. Ciyê şer lê derketî û televizyonê nişan dayî ew der bû. Mijara herî girîng ya ku divê bê zanîn ew e ku tişta ji bo Şam û Enqere girîng desthilatdarî û berjewendiyên wan in. Derdê wan ne ew e ku dinya ji belaya DAIŞ`ê rizgar bib e. Ji ber wê divê gelên Sûriyê guhê xwe nedin vê siyaset û propagandaya navendên desthilatdarî û berjewendiyan.